Sal 1 — Hejmar 8

# ROJA NÛ

Duşemb 21 Hizêran 1943

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

CENG & SIYASET

## DEWRAN

### Dilqewînî û Bawerî

General De Gol li 18-ê hizêrarana sala 1940-î de, gava her kes bawer dikir ko Elemana zora dinyayê biriye û êdî riya xelasê hatiye girtin gotiye: Ev şer ne şerê çend miletan e, şerê miletên cihanê ye û şerê mezin hêj destpê ne kiriye; rojek dê bê bi 100,000 balafir; 50,000 tang, û bi arîkariya zehf top û bomban wê destpê bike û dewletên Mihwerê di pêşiya êrîşên Hevalbenda de perîşan û şerpeze bibin.

Gava General De Gol ev tişt digotin qîma xwe bi nefsa xwe û bi dilqewîniya Brîtanya-Mezin û sermiyanê wê Çorçil dianî.

Nihû Komîta Frensizî a xelaskirina welêt qerara xwe daye û ev roj dê bibe roja cejnê û frensiz êdaniya wê rojê bikin.

Ma kurd nabêjên ko şev reş bû tu reştir be. Dilê tirsok singa gewir na bîne.

### Serxweşî

Welatparêz û nivîsevanê rûsî ê bi nav û deng Ilya Ehrenburg di rojnama «Kraznaya Zvezda» de dinivîse: Danezanên me ducar dikin ko di tevayiya kadên şerî de sezayî gotinê tu tişt nîne. Di Eniya Rohelatî de eleman li ber halê xwe dikevin û texmîna dikin, texmînine tehl û nexweş. Elemana xwarine û vexwarine, şûşeyên vala û kasik û firax xistine derî û penceran, hinde serxweş keti bûn ko di sariya sibehê de, gava ji wan re hatiye gotin: Heqe xwarin û vexwarina xwe û bihayê hûr û girên şkênandî divê bête danîn, di nav dû û dûmanên serxweşî û gêjbûna xwe de ecêb mayî man.

o o o

Per û perengên dilê me ne bûne reş, sor in, germ in, agirê hinav û hundurê me ne tefiyaye û bi birha heyfa ko, heyfên ko divê bêne hilanîn dişewite. Eleman dizanin û ew pê dihesin ko roja hisab û intiqamê hin bi hin nizingtir dibe.

### Azahî û Serbestî

Eleman di pêşiya xwe de çi dibînin; Pirsek bi tenê; MIRIN! û ev pirs bi agir hatiye nivîsandin. Em di pêşiya xwe de çi dibînin; azahî û serbestî; azahî û serbestî ji bona miletên ko heqê wan hatiye şkênandin û ketine hêsîriyê; heq û edalet ji bona hemî miletên cihanê û zefer û serfirazî ji bona Ûrisên ezabdîtî.

o o o

Em hatine gundekî jinikek, destê wê de kaxezek, perîşan û eqilwindayî dilezîne û ber bi me ve tê, kaxezê dide destê me û dibêje: Hevalên min, brayên min, xwezila... hon dereng hatin; diviya bû berî saetekê bên, birine... rerevandine... bi xwe re birine... Em dilşikestî li kaxezê dinêrin; têde keçikên rûsî nivîsandine... Bra û pismamên me xwe bilezînin, heye ko hon dikarin xwe bigehînin me; eskerên elemana em birine, werin, zû werin gazî û hawara xweh û dotmanên xwe...

# ENIYA KUBANÊ

### Şerên Hewayî Bi Şkênandina Elemana Qediyaye

Moskû — A.F.I. Ev mehek e, di ser axa Kubanê re, di nav bira refên rûsî û yên elemanî de, şerine hewayî ên xurt dom dikirin, nihû ev şer bi perîşaniya elemana qediyaye. Elemana li wê, bi qiwetine mezin siûda xwe ceribandine, lê dîtine ko şkênandina nêçîrvanên rûsî tiştekî gelek giran e û ew êdî pê nikarin, gelek balafirên elemanî hatine avêtin erdê û bihna refên elemanî ên mayîn çikiyaye.

Moskû— Eleman cehda xwe dikin da ko bizanin di eniya rohelatî de qiwetên rûsî çiqas in û çawan hatine belav û kom kirin û bi vê qesdê zehf caran êrîş kirine, lê hemî êrîşên wan hatine bi şûnda avêtin û xesarine dijwar gihaye wan.

# Balafirgehên Mihwerê

### Di Bin Derb û Aşirê Çekê Hevalbendan De

Cezayir — R: Êrîşên Hevalbenda yên hewayî di eniya Behra Spî de bi awakî gelek xurt destpê kirine. Refên mezin ji bombeavêj, nêçîrvan û nêçîrvanên bombeavêj bihevketî bi ser erdê Sicilyayê de girtine û li balafirgehên Kastel Vetrano, Borizo, Boka di Falko, Sîsiya, Katan û Maloyê xistine. Bi derbên balafirên hevalbend zehf awahî û depoxane xira bûne û agir bi kar û barên balafirgehan ketiye; rivînî û pêtiya vî agirî ji 100 kilomêtir xuyanî dibû. Der şerên hewayî 170 mekîneyên Mihwerê hatine avêtin erdê; 6 balafirên Hevalbenda venegeriyane warên xwe.

Cezayir — Nûçegihayê Ejensa Roytêrî ji Qerargeha Hevalbenda a Mezin li Efrîqa Bakurî elam dide: Balafirên Welington, şevêdî gava direjî Mesinayê — axa talyana—kirine, bombeyine mezin her yek ji wan du hezar kîlo giran berdane vê şaristanê; di nav hêjagehan de du şewatên mezin çêbûne. Kelehên firok di bendera talyanî Speziyayê de, xesarine dijwar gihandine, qriwazoreke talyanî ji tîpê Litoriye.

Londre — R: Wezîrê Ewistralî ê dervekariyê Dr. Evat ji Emerîkayê hatiye Londrê, ewê bibe mêvanê Brîtanya-Mezin û dê bikeve civanên wezareta Şerî.

Londre — Rojnama elemanî Das Reich dinivîse ko 40,000 firen siza xwe ji erdê Frensê xelas kirine û xwe gihandine Frensa Şerevanî.

# WELATPARÊZÊN NORVECÎ

### Taluka Mirinê de Jî Direjî Neyarên Welêt Dikin

Londre - A. F. I. Wetenperwerên norvêcî stayona radyoyê a Stavangerê, ya ko li ser hisabê elemana dixebitî ber hewa kirine; welatparêzên norvecî ên din di nîzîkî Osloyê de—payetextê Norvecistanê—depoxaneke eskerî şewitandine û trênek ji rê derêxistine.

Londre— Şevêdî di ser Ingilistanê re 5 balafirên elemanî hatine xistin erdê.

Qahire — Bi awakî resmî didin zanîn: nêçîrvanên brîtanî ên dûrger di Behra giravan de — hêla Derya Spî a rohelatî — gemiyeke dijmin dane ber bomban, gava balafirên brîtanî jê bi dûr diketin; ew gemî bin av dibû.

Melburn — R: Refên Hevalbenda di avên Nû-Gineyê de, direjî waporeke japonî kiriye 5,000 ton mezin û lêxistiye, agir bi vê gemiyê ketiye û ew teqiyaye.

Qahire — Nêçîrvanên brîtanî di hêla Behra-Spî a rohelatî de Meserşmîdekî 109 aniye xwar, tu xesar ne gihaye balafirên brîtanî.

Weşington — A.F.I. Kardariya emerîkanî a behrî elam dide ko ji destpêka şerî û heta nihû destgehên emerîkanî 1580 wapor çêkirine.

Nû-York — R: Rojnama emerîkanî «Nû-York Teymis» ji Bernê — payetextê Svîçreyê — seh kiriye; xesarên ko bi bombardimanên refên brîtanî di Germanistanê de çêbûne nayin tehemil kirin: bajarên mezin bûne, xerabezar, bi hezaran peya hatine kuştin û brîndar kirin û xelkên mayî ketine perîşanîyeke giran. Valakirina mala jî tiştekî gelek zehmet e û bi tenê mirovên dewlemend pê dikarin.

Cezayir — R: Komîta Frensizî a xelaskirina Frensê îro civanek danî; General De Gol, General Jîro û 13 lêbatên Komîtê ketine vî çivanî.

### Gaziya Me Dikin

Hey hat... dil bi kulo dilo... em dereng mane; me xwe lezand lê nikarî bûn xweh û dotmamên xwe ji destê elemana xelas bikin; Tiştî ko hemî Ûris ji dil dixwazin ev e; bila roj berî rojekê şerine mezin û xwîndar destpê bikin, heyfên ko divê bêne hilanîn zehf in; gund û bajarên şewitandî, jin û zaroyên perîşanketî.., laşên mêrxas û ciwanmêrên ko li erdê mane, gaziya me dikin.

MEZINÊN DINYAYÊ



SEREKWEZÎR Mr. ÇORÇIL

## DÛRIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ

### Kanî

Kaniya serê Sirtikê
Çavreşê meşqitikê
Tama memkên te xweş in
Weka hêka qitikê.
Ezê bi çeplê te bigrim
Bavêm qeza Dêrikê.

Min û kaniya Merzeqa
Eniya gewra min bi deqa
Heke tu delala min î
Destê xwe bi destê min kî
Ezê bi çeplê te bigrim
Bavêm her du Sinceqa.

Kaniya serê Mêrgeo
Kengê her û kengê bê o
Ez xulamê bejn û balê o
Heke tu delala min î
Destê xwe bi destê min kî
Emê herin binya xetê o.....

### GULÉ

Hay lê Gulê, lê Gulê
Eman Gulê yar Gulê
Dem û dewran Gulê
Derd û derman Gulê

Ehtiqat û nezan Gulê
Dîs Fbenga Xortan Gulê
Eman gulê yar Gulê
Beybûn û qurnefilê.

Gulê gulçîçekê
Rêhana li ser doşekê
Destê xwe xist kêlekê
Ziravê meşordekê.

Hay lê gulê, lê Gulê
Gul bû, gul bû, gul bû
Baranê dayê şil bû
Qîza axayê min bû.

Hay lê Gulê yar Gulê
Destê xwe xist paşilê
Çi paşilka xweydayî
Serê memika hildayê.

Eman gulê yar Gulê
Derd û derman Gulê
Dem û dewran Gulê
Ihtiqat û nezan Gulê.

### ZEYNEBÊ

Eman, ne man Zeynebê
Li ser şa'ir qesebê
Bila tembiya min li te bê
Ji xewka şêrîn ranebê.

Eman, ne man lê Zeko
Tu bi qedrê rebê xwe ko
Tuê bişkoşkê xwe veko
Devê min di memkê xwe ko
Ez zarok im, nezan im
Bêdiliya lêwik me ko.

Eman; ne ma Zekiya
Berfa bi şev bariya
Li ser zimana heliya
Ez ketim dil im êşiya.

Kul ket mala gundiya
Ji reşka re û rîspî ya
Ji xilaf xort û naşiya.

www.arsivakurd.org

# DEMA NIHA

## Di Eniyén Dinyayê De

### Hevalbend Bi Derbên Xwe Dijmana Dişidînin

SOVYETISTAN: Şerên hewayî dom dikin; li bêjê sezayî gotinê tu tişt nîne.

BEHRA SPÎ; Refên Hevalbenda bajar û benderên talyanî Sîrakuza, Regiyo û St. Ciovaniyê bombardiman kirine.

ENIYA ROAVAYÎ : Refên brîtanî febrîqeyên Şneyder li Krezoyê dane ber bomban. Di Etlentîkê de 5 noqavên elemanî hatine xeriqandin.

PASIFÎK: Balafirên Hevalbenda li Rabulê û qerargehên japona yên giravên Şortlendê xistine.

CEZAYIR — Qerargeha Hevalbenda a mezin li Efrîqa Bakurî dide zanîn: Kelehên firok direjî Mesînayê kirine û xesarine dijwar gihandine hêjageh û kar û barên rêhesinan; Balafirgeha Miloyê jî—erdê Sicilyayê—bi awakî xurt hatiye bombardiman kirin. Refên hevalbend ên din, di Serdinyayê de qerargeha Obayê dane ber derbên xwe; agir bi sê waporan ketiye. Jê pê ve bombeavêjên Miçels xelîça Aransiyê de, li hêjagehan û di Serdinya nîroyî de li pir û rê û rêhesina xistine; ev bombardimanên he gelek xurt bûn. Duhî di şerên hewayî de 39 balafirên Mihwerê hatine avêtin erdê; 3 mekîneyên hevalbend venegeriyane warên xwe,

Montevîdeo — Mr. Lansiyal nimînendeyê General De Gol di Emerîka jêrîn de, bûye nimînendeyê Komîta Frensizî a xelasiya welêt, li Uruguwayê.

# GUADEL KENAL

### Serfiraziya Bombeavêjên Hevalbenda A Me in

MELBURN — R: Balafirên Hevalbenda ji tîpê Liberator û Katalîna di behra Pasifîkê de êrîşî girava Moruyê kirine. Di şerê Guadel-Kenalê de 94 balafirên japonî hatine avêtin erdê. Japona bi 120 nêçîrvan û bombeavêja direjî Guandel-Kenalê kirine, lê bi tenê bist û şeş mekîneyên wan bi şûnda vegeriyane; 77 hebên wan di şerên hewayî de û ên mayîn bi agirê topên balafirşiken hatine xira kirin.

WEŞINGTON — Ji destpêka vê salê û heta îro destgehên emerîkanî 766 wapor çêkirine. Ji wextê ko Emerîka ketiye şer, waporên emerîkani ên nû yên ko ketine behrê 1609 heb in.

ÇUNG - KING — Serfermandariya Çînê elam dide: leşkerên çînî êrîşên japona di Hunana roavayî de sekinandine. Di nevala Yang-Tseyê de, qiwetên çînî dora bajarekî din girtine û şargeh û penahên vî bajarî bombardiman dikin. Refên emerîkanî pişta leşkerên çînê xurt dikin.

LONDRE — Serek Benes—sermiyanê Çekoslovakî—nîşanên xaça şerî, daye General Martin Valin, fermandarê qiwetên Frensa Şerevanî ê hewayî û 11 balafirvanên frensiz.

### Strana Kurdî

## EVDO

Evdo de menal, Evdo de menal,
Gava ko dengê nalîna tê te
Qet hêwî û tebata min nayê
Ezê ji heybetê te re dikevim tayê.
Mi dî Evdê Elî bi sê
Dengan ban dikirî
Emîşê dayê û Hesma lawo
Û Xeco porkurê
Honê daw û derlingên xwe
hilkin û bilezînin
Bi serê Xanik û Xidûra şewitî kevin
Sê denga li Musayê Silo, axayê xorta,
Kevirê kozîberê Dêrê Ermeniya kin,
Bikin hawar û gazî bên:
Silav u kilama Evdê Elî
bavê Şakir li te hene.
Binêr bê hawarke ji me re naşînê
Her çar malên Xerabazinya şewitî
Bi Evdê Elî re û Siloyê
bira re xain in.

Tirsa min ji vê tirsê
Laşê Evdê Elî û Siloyê bira
Li Xerabazinya şewitî
Li nav koma dijmin û
neyara de bimînin.
Gava ko Emîşê di ser
Xanik û Xidûra
şewitî dikevin
Sê dengan li Mûsayê Silo dikin,
hawar û gazî,
Mûsayê Silo dibêje Êmîşê dayê
Here silavê min, li ser Evdê Elî
bavê Şakir gelek hene
Tembiya min lê be, bila derba xwe
Li mêrê hikûmetê ne xîne.
Peşîya hikûmetê ziraye
Dawiya wê stûr e.
Tu imkana me bi mêrê
hikûmetê tu nîne.
Gava ko Emîşê tê
Ji lawê xwe Evdo re dibêje
Tu ronahî li çavê Evdo na mîne.

Mi dî Siloyê bira bandikirî
keko Evdo
Tu serê xwe li ser kozikê
li ser çeperê biderînî
Li birînê kekê xwe
Siloyê bira bimeyizînî.
Gava ko Evdê Elî li birînê kekê xwe
Siloyê bira dimeyizînî
Paketê li newka niqtaliyê dixînê
Li ser sebrî baş çawişê
nizamî deytînê
Sebrî başçawişê nizamî
Ji ser pişta hespê dîqulipînî;

Berê niqtaliyê vedigerînê li ser
Mihemed Letîfê Hestilî deytînî
Li rehnê rastê dixînê
Di newka şinbozê re difirînê.
Evdî Elî radibe ko here tifinga wî
Ji xwe re bînê
Mihemed Letîfê Hêstilî mêrê
namûs û xeyretê
Destê xwe davê qundaxa mawzerê,
bi ber xwe tînê.
Li ser Evdê Elî, bavê Şakir deytînê.
Li çiçika rastê dixînê
Di riha mixasiyê re difirînê.
Hewar e, sê carî hewar e
Evdî Elî kuşti ye
Siloyê bira bi sê gulan brîndar e
Her çar malên Xerabazinya şewitî
Bi Evdê Elî re û Siloyê
bira re dijmin û neyar e
Li ser Evdê Elî û Siloyê bira rabûye
esker û ferman e.

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ

## ÇAWAN DESTPÊKIR



QIWETÊN HEVALBENDA BERÎ SALEKÊ DERKETINE ERDÊ EFRÎQAYÊ



TANGEK BERÊ XWE DAYE BEJÊ.



ESKEREN EMERÎKANÎ PÊŞ VE DIKEVIN



PAQIJKIRINA ERDÊ EFRÎQAYÊ WILO DESTPÊ KIR

www.arsivakurdi.org

1ère ANNEE LUNDI 21 JUIN 1943 NUMERO 8

# LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

### CHRONIQUE HEBDOMADAIRE DE LA GUERRE

Cette dernière semaine, la dernière du printemps s'est déroulée sans événements décisifs sur le plan militaire. Mais l'imminence supposée de grands opérations provoque de la nervosité qui se traduit par la mise en circulation des rumeurs les plus fantaisistes: le grand «canard» de la sa semaine semble avoir été l'arrivée à Alger du prince Umberto et du général Badoglio. Il est en tout cas certain que tout ne va pas pour le mieux dans la péninsule puisque le parti fasciste en arrive à se purger lui-même. Le nouveau secrétaire général Carlo Scorza est investi de pouvoirs dictatoriaux tandis que Mussolini semble petit à petit s'effacer. Le bombardement des bases insulaires et de l'Italie de Sud a continué sans répit.

Au Nord-Ouest, la R.A.F. a bombardé le Rhin où Oberhausen a été le principal objectif et dans la nuit de samedi à dimanche les Anglais ont lancé un fort raid contre le Creusot; ce raid vient 8 mois après le précédent et ces 8 mois étaient le délai estimé nécessaire pour la remise en état des usines Schneider. En même temps la centrale éléctrique de Montchanin qui fournissait la force motrice au Creusot a été gravement endommagée.

Dans l'Atlantique après une bataille navale qui a durée 5 jours, 5 sous-marins allemands ont été coulés d'autres ont été touchés et les 97 % du tonnage du convois sont passés.

En Russie on ne signale qu'une intense activité de l'aviation.

En Extrême-Orient une grande offensive aérienne des Nippons contre Guadalcanal s'est soldée par une éclatante défaite puisque 94 avions japonais ont été abattus. Sur le front du Yang-Tsé l'avance chinoise continue

Du côté français on a célébré avec éclat dans tout l'Empire, le 18 Juin, le 3ème anniversaire de l'appel du Général de Gaulle. Cette grande date mérite de prendre place dans le calendrier de l'après guerre sur le même plan que les grandes fêtes nationales du 14 Juillet et de 11 Novembre.

Cette célébration en tous cas a eu cette année un grand retentissement dans le coeur de tous les Français, libres ou enchaînés, le lendemain de leur accord et la veille de la grande invasion dont le Département de la Marine à Washington annonce qu'elle est matériellement au point. **B.**

### LES ELECTIONS AURONT LIEU LE 10 & LE 26 JUILLET EN SYRIE

On annonce officiellement de Damas que les élections législatives syriennes qui ont lieu à deux dégrés ont été fixées au 10 et au 26 Juillet. Le nombre des députés qui était de 101 à la dernière Chambre, est fixé à 122.

## LE CAPITAINE LAURELLE

C'était un de ceux qui, dès le début, n'acceptèrent pas le fait accompli et sans hésitation se joignirent au Général de GAULLE.

Il quitta l'Amérique où il était attaché à la Mission Militaire Française pour rejoindre le Général de LARMINAT à BRAZZAVILLE en Octobre 1940. Devenu son aide de camp, il ne cessa ensuite de l'accompagner.



Nous l'avons tous connu, re grand garçon bien découplé dont le regard n'avait pa encore entièrement perdu l: reflet de l'expression naïve des jeunes.

Le 11 MAI à TAKROUNA, il était encore un «jeune», en effet: Il disparaît dans la fleur de l'âge, après s'être héroïquement défendu à la grenade en tête de l'unité dont il avait solliciter le commandement. C'est sur ses instances qu'il lui avait été accordé. Sa fonction normale d'aide de camp du général de LARMINAT, bien que non exempte de danger, ne l'obligeait cependant pas à payer de sa personne. Mais il voulait se jeter au coeur de l'action en qualités de chef avec toutes les joies, les responsabilités e) les sacrifices que comporte la fonction.

Déjà en LYBIE, à l'époque où la situation paraissait relativement stable; il avait tenu à participer aux sorties de ces «Jack Colonnes» qui allaient hardiment à travers le désert pour tâter l'ennemi, repousser ses patrouilles et surprendre ses avant-postes.

Plus récemment, un terrible accident survenu à la voiture de son Général avait failli lui coûter la vie. Il en était réchappé comme par miracle, et après un court voyage en Amérique où habitaient les siens, il était revenu plein de joie prendre part à l'offensive qui se déclenchait contre ROMMEL.

L'entrée en Tunisie combla ses voeux les plus chers: enfin l'ennemi abhorré était saisi à la gorge en terre française! Il fallut hélas que la cruauté du destin le privât du spectacle de la capitulation sans conditions d'une armée de 250.000 germano-italiens. Il fut tué en montant à l'assaut des restes de la fameuse 90e Division Légère Allemande retranchés dans le Djebel ZAGHOUANE.

Le Capitaine de Cavalerie LAURELLE est enlevée à l'Armée au moment où la France, reconstituant le faisceau des forces nationales, s'apprête pour le dernier assaut qui doit la délivrer de ses bourreaux.

Déjà, elle a repris son rang. LAURELLE est l'un de ceux qui ont le plus contribué à le lui rendre. Il rejoint dans le séjour que DIEU réserve aux Preux GÉNIN, les SUBBERBIELLE, les D'ARMAZE, les AMILAKVARI et tant d'autres qui déjà l'y ont précédé.

Son souvenir demeurera parmi nous comme celui d'un Français et d'un soldat qui sut toujours en toute simplicité faire son devoir. RENÉ BOISSEAU

## Les Dépêches de la Nuit

FRANCE : Le Général DE GAULLE présidera aujourd'hui à Alger une séance pleinière du COMITÉ FRANÇAIS de la LIBÉRATION.

RUSSIE : Activité aérienne de part et d'autre. Rien à signales sur l'ensemble du front.

MÉDITERRANÉE: Bombardement SYRACUSE, de REGGIO et de SAN GIOVANNI par l'aviation américaine d'Afrique du Nord.

EUROPE : Bombardement des usines SCHNEIDER, au Creusot par la R.A.F. Bataille navale dans l'Atlantique : 5 sous-marins allemands coulés.

PACIFIQUE : Attaques de l'aviation alliée contre RABAUL et les bases japonaises dans les Iles SHORTLAND.

### LA PRESSE KURDE

*Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:*

**RIYA TAZÉ**. organe des Kurdes de l'U.R.S.S paraissant à Erivan.

**GALAWÉJ**. la plus grande revue littéraire kurde, parait chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte

**JIYAN** hebdomadaire politique et littéraire paraissant à Souleymanié.

**HAWAR**. revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes kurdes et français.

**RONAHI** Revue mensuelle illustré, paraissant à Damas.

*Provisoirement,* LE JOUR NOUVEAU *paraîtra une fois par semaine, le Lundi.*

## LA VOIX DES ONDES

*Le 11 Juin, à 11 h 20 du matin, Pantellaria s'est rendue aux Alliés. Radio—Londres a appris cet événement à ses auditeurs, en y ajoutant le commentaire suivant* «Pour la première fois dans l'histoire, on s'est emparé d'une ile sans intervention des armées de terre, ni même des parachutistes, par la seule action des forces navales et aériennes.»

*Le même jour, Radio—New York donne les précisions suivantes:* «Pantellaria est une petite île située entre la Tunisie et la Sicile, montagneuse et puissamment fortifiée. Dès avant la guerre, les italiens en avaient interdit l'accès pour garder un secret absolu sur ses travaux de fortification.»

*Il n'y a pas un mois, Radio—Rome citait l'orgueilleuse déclaration de Mussolini:* «C'est le plus puissant bastion défensif de la Méditerranée, rivale et contre-poids de Malte.» *Le speaker ne pouvait s'empêcher d'y ajouter ces mots de son crû:* «L'île se défendra et tiendra contre tous assaut.»

*A la même époque, Radio—Berlin était encore plus catégorique:* «Pantellaria est un modèle des défenses de la forteresse Européenne. De même que Pantellaria, tout autre point de notre continent saura résister victorieusement à toutes les attaques Alliées.»

*Mais l'île une fois prise, ceux qui venaient de la couvrir de tant d'éloges changeaient d'avis. Dans la soirée du 11 Juin, Radio—Rome déclare:* «Pantellaria était aussi peu importante et aussi impossible à défendre que les deux petites îles anglo-normandes abandonnées par l'Angleterre en Juin 1940. Pourtant, Pantellaria a été défendue: car la marine, l'armée et l'aviation italiennes ont pour l'habitude et pour tradition de ne jamais abandonner une position avant d'en avoir épuisé les possibilités extrêmes de défense.»

*En une phrase lapidaire, Radio—Londres met les choses au point:* «Les forces aéro-navales Alliées ont mis trois semaines à réduire une forteresse que Mussolini a mis sept années à fortifier.»

*Pantellaria est tombée le 11 Juin, trois ans, jour par jour, après le premier bombardement de Malte par l'aviation axiste. Les deux bases Méditerranéennes furent souvent comparées.*

*Londres vient de citer cette opinion de l'écrivain nazi Jürgen von Turnberg:* «Entant que base, Pantellaria a une importance formidable: Elle contrôle toutes les communications de la Méditerranée. Depuis son aménagement définitif, Malte a perdu une bonne partie de sa valeur stratégique. Les italiens jubilent, et ils ont raison, car La Valette est une véritable souricière qui ne pourrait résister à plusieurs jours de bombardement.»

*Ces fortes paroles avaient été prononcées en Mai 1940. Un an plus tard, le 17 Mai 1941, Radio—Berlin affirmait:* «Les attaques répétées contre Malte ont rendu l'île inutilisable comme base de sous-marins et d'avions.»

*Une autre année s'écoule, mais Berlin est toujours de même avis, déclarant le 26 Mai 1942:* «Malte n'est plus qu'un abscè purulent en pleine Méditerranée.»

*Ayant subi plus de trois bombardements par jour—3,300 en trois ans—Malte a tenu bon. Un peu plus d'un an après que Radio—Berlin en avait promis la chute, ce n'est pas Malte qui s'est rendue, mais, sa rivale et son contre-poids Pantellaria.*

*Avant sa prise, Berlin et Rome avaient eu la plus haute opinion de son importance. Sans aller aussi loin, Londres résume ainsi les résultats de son occupation* «L'île servira de base d'escale aux petits bateaux Alliés qui auront la tâche de débarquer des forces sur les côtes italiennes. Sa prise renforce la sécurité des routes Méditerranéennes.»

*Mussolini a toujours aimé parler du «Mare Nostrum». Depuis la chute de Pantellaria, ce sont les Alliés qui peuvent à juste titre, se servir de cette expression.*

*La prise de Pantellaria a été suivie, dans les 24 heures, par celle de Lampeduse, dont la garnison de 3.000 hommes s'est rendue à un pilote de la R.A.F. Voilà comment Radio—New York raconte cet incident:* «Obligé de faire un atterrissage forcé, sous le bombardement ininterrompu de l'aviation alliée, le sergent anglais s'attendait à être fait prisonnier, quand il vit se précipiter vers lui plusieurs soldats et officiers italiens. Quelle ne fut pas son ahurissement de s'entendre dire: «Pour l'amour du ciel, faite quelque chose pour que ce bombardement s'arrête.» Et il n'eut plus qu'à partir, porteur de la demande de reddition de l'île.»

*Commentant cet événement, Radio—Londres déclare:* «Certains journaux italiens ont préconisé de lyncher les aviateurs Alliés qui seraient amenés à atterrir en Italie, suivant ainsi l'exemple du Japon. Ne serait-il pas infiniment mieux de les renvoyer vers le Q. G. allié, un rameau d'olivier dans le bec de leur Spitfire ? »

LUCIE VIDAL

## DI WELATÊ ZEMBEQÊ GEWIR DE

*Nivîsevan* *Grigori Petrof* — 5 — *Wergerandok :* *Qedrî Can*

### Dîroka Suomî

Min; Finlanda gelek caran ziyaret kir... di her aliyê welêt de geriyam... di bajarên mezin de, di nav çiya û golan de mam... min her tiştên wan dît... lîsk û jiyîna wan, roj bi roj, temaşe kir. Bi rastî, min saz û stranê wan, edebiyat, resamî, tiyatiro, û mîmariya vî miletî teqdîr kir. Ji dil dibêjim, ku her çiqas di ber wan de derbas dibûm, heyreta min bêtir dibû. Di her gera xwe a dawî de, min ev miletê bakurî, biçûk û bêdeng teqdîr û tehsîn dikir. Di jiyîna miletê Fîn de du tişt hene ku bi kêrî nivîsandinê tên:

1.— Miletê Fîn, hetanî serdestiya Ûris, yanî heta sala (1917) jiyîna serxwebûnê ne dîtiye.

2.— Vî miletî, merivê mezin ên yekta ne anîne meydanê, medeniyet û hirsa Finan, tenê ji xebata ferdên milet pêk hatiye...

Miletê Fîn, di nav bera rojhelat û bakurê Rusyê, di quncika dawî de, dimîne. Ji aliyê din bi (Îsweçê) ve yek-sînor e. Heta sala (1811) miletê Fîn, di bin destê Îsweçan de bû; muameleya Îsweçan li ser Fînan, wê gavê, mîna muamela Awistirya ku li ser Sirbê Bosna Heresek û Voyvodînê bû... Yan jî wek muameleya ku di zemanê serdestiya Turkan de, Rûnan li Bulxaran dikirin. Çiqas hukûmet û quwetê îdarî; ticaret û pafriqe, dibistan û kilîse hebûn.,. di destê Îsweçan de bûn. Mamûrên îdarî, hakim û zabitan, mamostê û reban giş bi destê Îsweçan dihatin bijartin. Îsweçan, xwe bi medenîyeta xwe, dinepixandin. Bi çavekî nizm û kêm li xelkê Fîn di nêrîn û bi wî ayî jî ev di êşan din. Xelkê Fîn bi heqên xwe ên siyasî, mîna Îsweçan bûn. Lê bi fikr, îqtîsad û exlaq kêmxistî bûn, li paşmayî bûn. Ev halên ha li ser pêşveçûna çanda miletê Fîn pir te' sîr kiri bû; ji dawiya bablîska (18) ve heta sala (1840)î, (çand) hirs a Fînan, mîna çîçeka di nav mexzeneke bê hewa, jar û çilmisî bû. Wê gavê Fînan ji henek xwendin û nivîsandin pêve tiştek nizanî bûn...

Di sala (1808) de, di nav Ûris û Îsweçan de şerek çê bû; Çarê «Aleksandir» ê ewil, teva leşkerên xwe nîve Finlandayî xist bin destê xwe. Paşê, di baejarekî Fînan (Borago) de «Seyin» yanî c i v a t e k e qewmî, ji Fînan vexwend û ji wan re ev pirs kir:

Ûris, ewê, ji we re serxwebûneke hundurî (îstiqlalekî daxilî) bide... Hûn vê îdareyê dixwazin, yan îdareya Îsweçan?...

Mumesilên Fînan, bi dengekî, îdara Ûris xwestin.. Li ser vê yekê Çar (Aleksandir) sond xwar ku ewê li ser gotina xwe bimîne.

Îdareya Ûris, ji bo her du aliyan jî, çêtir bû; Finlanda bi xwe welatekî feqîr e. Hindistan û Misir ji bona Ingilîz bi kêr in... lê tu kêr bûna Finlandayê ji bona Ûris re nîne. Finlanda jî mîna Qefqas, Qirim û Turkistana Rusyê ye... Ji girtina Finlanda Rûsya, tu fêda madî û îqtîsadî ne dîtîye. Lê ji alîkî din, ji Rusyê re bi kêr hatiye; ew ji ev e:

Payetextê Ûriş, bi çar saetan ji Finlandayê bidûr bû; rojekê ji rojan, dijminê Ûris, kanî bûn xwe bigihînin Finlanda û ji wir payitextê Ûris tehdîd bikin. Ji ber vê yekê, îstîla Finlandayê, ji bona parastina payitext bi kêr hati bû dîtin. Ji aliyê din, Finlanda jî, bi standina heq û serxwebûna xwe kêfxweş bû.

## DERDÎ DIL

Le zemîn da toxmî Kurd e,
Dil şikest û reng zerd e;
Xane wêran û ser gird e
Dil kul û dil pir derd e
Em karê karî xo kirde
o o o
Em toxmey pak û şirîn
Sorgulî baxî zemîn
Awî jiyaniyan lê birîn
Be sûc hişk bûn û werîn
Gewre man dil wek berde.
o o o
Bihar e, welat xoş e
Reng rengî gul direwş e
Dar û berd cengfiroş e
Nîşanî man reşpoş e
Bo sinorî bê perde.
o o o
Niştimanî xakî kurd
Rabe li xew dest û bird
Bike dermanî derdî kurd
Pîr û ciwan giştî mird
Hêzit bilind û gird e
o o o
Ey nevey arî û twênî pak
Dest de pênoş û çekî çak,
Bo rizgarî toxm û xak
Ser û giyan bide bê bak
Serfiraz û dirinde
o o o
Em lane lanêî şêr e,
Niştimanî dilêr e,
Ser bilind û çaw têr e,
Serapa sîw û zêr e,
Lê pêrew û peyman werd e.
o o o
Be dengî bilbilî bak e
Bilê zû were kak e
Destî yek bigirîn çak e
Bikeyn dermanî em xak e
Rêgaman kêw û herd e

KAKE EMÎN HIWÊZÎ

## ÇAPA KURDÎ

KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

Kovar û rojnameyên kurdî yên ko îro belav dibin ev in:

Reya-Teze : Li heftê sê caran û li bajarê Rewanê belav dibe; rojnameya kurdên Sovyetistanê ye. Bi zar û bi tîpên kurdmancî tête nivîsandin.

Jiyan: Kovareke edebî û ilmî ye; li serê her heftê carekê û li Sileymaniyê bi der têt. Bi zarê soranî têtê nivîsandin.

Gelawêj : Kovareke edebî û ilmî ye. Li serê her mehê carekê li Bexdayê derdikeve. Zarê wê soranî ye. Kovara Kurdî a mezintir û tekûztir e.

Hawar : Kovareke edebî ye. Ji sala 1933-an ve li Şamê û bi zarê kurdmancî têtê belav kirin.

Ronahî : Ev du sal in, li Şamê dest bi derketinê kiriye. Zarê wê kurdmancî ye. Ronahî kovareke misewer e û li serê mehê carekê derdikeve.

## PÊJINÊN DINYAYÊ

KIŞWERÊ FRENSIZÎ


GABON. LIBERVIL: DESTPÊKA KONGOYA FRENSIZÎ.


LIBERVIL : AVAHIYÊN BAZARÊ


GUNDIYÊN ERDÊ BAPUNUYÊ.


BEXÇEYÊN XESTEXANA LAMBARENÊ

IMP. LE MIROIR D'ORIENT - BEYROUTH